# Aştî السلام

ASTÎYA DEMUQRAT

www.selamdemocratic.com
selamdemocratic@gmail.com
partiya.asti

ROJNAMEYEKE SÎYASÎ - CİVAKÎ - ÇANDÎ

Hijmara (44) Nîsan 2020


## Rêverîya Xweser qedexeya derketinê heta 1ê gulanê dirêj kir

Ji 23yê adara 2020an ve, li herêmên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê, ji ber vîrosa koronayê qedexeya derketinê lidar e.
Cara pêşîn qedexeya derketinê ji 23yê adarê heta 7ê nîsanê, cara duyem ji 7ê nîsanê heta 21ê nîsanê û herî dawî ji 21ê nîsanê heta 1ê gulanê hat dirêjkirin.
Sibeha 21ê nîsanê, Hevserokatîya Meclisa Cîbicîkar a Rêveberîya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê, bi biryarnameyekê da zanîn ku qedexeya derketinê dê heta 1ê gulanê bê dirêjkirin.
Di biryarnameyê de hin rewşên awarte ku li ber qedexeyê nakevin hatine destnîşankirin. Alîyên ku li ber qedexeyê nakevin, ev in:
- Hemû dermanxaneyên mirov, riwek û ajelan.
- Dikanên ku şînkahî û mêweyan difiroşin, her wiha ên goşt û şîranîyê û xwedîyên bestekan û etar.
- Dikanên ku pêdivî û kelûpelan rojane difiroşin.
- Dikanên xurdekirina diravan, tenê rojên sêşem û înîyan.
- Karmend û hostayên ku avahîyan lê dikin, her wiha firoşgehên ku kelûpelên avahîsazîyê difiroşin.
- Bi şertê ku di her otombîlekê de ne zêdeyî 10 kesan bin, tevgera cotyar û felahan dê were hêsankirin.
- Otombîlên ku kelûpelên xwarinê û dermanan, şîrê zarokan û sûtemenîyê bar dikin.
Lê di biryarnameyê de hatiye, kesên ku li ber qedexeyê nakevin, pêwîst e ku ji karmendên xwe re lepik û maskan dabîn bikin û bi qasî ku tê xwestin ji hev dûr bisekinin.
Li gor amarên fermî yên Rêveberîya Xweser, heta niha tu rewşên pêketîyên koronayê li herêmên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê nehatine tomarkirin.
Lê belê Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanî da zanîn ku di 2yê nîsana 2020an de pêketîyekî koronayê ku welatîyekî bajarê Hesekê ye, ji ber nexweşîya koronayê li nexweşxaneya niştimanî ya Qamişloyê wefat kiriye.
Ji alîyê xwe ve Rêveberîya Xweser daxuyanîya Rêxistina Tenduristîyê şermezar kir û da zanîn ku Rêxistinê ew agahdar nekiriye.
Li alîyê din, Wezareta Tenduristîyê ya Sûrîyeyê ragihand ku heçî pêketîyên koronayê ên li Sûrîyeyê, tev li Şamê ne. Ango ji Şamê pê ve, li tu parêzgehên din rewşên pêketîyên koronayê nehatine tomarkirin.
Di heman çarçoveyê de, di navbera dezgehên Rêveberîya Xweser û rêjîma Sûrî li firokxaneya Qamişloyê de nakokî derdikevin, çimkî Rêveberîyê biryar daye ku heçî rêwîyên ji Şamê tên gerek bi qasî 14 rojan bêne karantînakirin. Lê hêzên rêjîmê, rêwîyên ku ji Şamê tên ji firokxaneya Qamişloyê bi qaçaxî derbasî nava bajêr dikin.

## Partîya Aştî êrîşên li ser Mexmûrê şermezar kir û bang li partîyên kurdistanî kir

Partîya Aştîya Demokart a Kurdistanê bi daxuyanîyeka fermî êrîşên esmanî yên dagirkerîya Tirkîyeyê li ser kampa Mexmûrê ya koçberan şermezar kir û bang li hikûmeta Iraqê û Herêma Kurdistanê kir ku hewlesteke jidil li hember van êrîşan raber bikin.
Di şeva 15ê nîsana 2020an de, firokeyên dagirkerîya Tirkîyeyê kampa Mexmûrê ya li Herêma Kurdistanê ku 12 hezar koçberan li xwe digire bumbebaran kir, di encamê de sê jinan jîyana xwe ji dest da û çend kesên din birîndar bûn.
Ji bo protestokirina vê êrîşê, Partîya Aştîya Demokart a Kurdistanê di 16ê nîsana 2020an de bi daxuyanîyeke nivîskî helwesta xwe nîşan da û ev êrîşa han wekî "berdewamîya dijminahî û tawanên Tirkîyeyê der heqê gelê kurd de" bi nav kir.
Di heman daxuyanîyanîyê de Partîya Aştî bal kişand ser wê yekê ku hevdemî nakokîyên di navbera PDK û YNKê de li devera Zînewirtê ev êrîşa han hatiye encamdan, "loma Tirkîyeyê keysa xwe ji van nakokîyên kurdî – kurdî anîye û berdewam dixwaze nasnameya gelê kurd û doza wî ya rewa armanc bigire."
Her wiha di daxuyanîya xwe de hişyarî daye tevahîya partîyên kurdistanî, "di van helûmercên han de bi taybet, divê haya wan jê hebe ku rêjîma Tirkîyeyê ya dexes hemî hewlên xwe ji bo têkdana her projeyeke kurdewarû disixurîne; çi li Kurdistana Iraqê be, çi li Sûrîye û Îranê be çi jî li Tirkîyeyê be."
Partîya Aştîya Demokart a Kurdistanê wiha daxuyanîya xwe bi dawî kir:
"Em bang li civata navdewletî dikin ji bo ku li hember Tirkîyeyê raweste û êrîşên wê yên li ser welat û miletên derdorê bide sekinandin. Lewra Tirkîye pabendî banga navdewletî ya sekinandina çalakîyên şerî nebûye û giranî nedaye xebata li hember vîrosa koronayê ku dunya tev daye ber xwe. Tevî wilo hîna jî bi awayekî rasterast an jî nerasterast, destek û alîkarîyê dide tundrewên li Sûrîye, Lîbya û dewletên ku bi palpiştîya Tirkîyeyê êrîşên terorî tê de têne pêkanîn. Her wiha em ji PDK û YNKê dixwazin ku nakokîyên xwe bi şûn ve bidin, li dor berjwendîya kurdî ya bilind bigihêjin hev, bi rêya danûsitandinê pirsgirêkên heyî çareser bikin û rê nedin Tirkîyeyê ku keysa xwe lê bîne, ji ber ku bi vî awayî hem her du alî hem jî tevaya Kurdistanê dê zîyanê bibînin. Dijmin di bendê de ye, bi qasî nakokî û dubendîyên kurdan tiştekî din bi kêrê nayê."

www.selamdemocratic.com
selamdemocratic@gmail.com
partiya.aşti

# Biçûktirîn bûnewerê ku dinya guherand

Eger berî du mehan li welatekî mîna Almanyayê biryara qedexekirina hatina zêdeyî du kesan a cem hev derketibûya, wê ev welat serobinoyî hev bibûya.
Lê aniha û piştî mehekê ji pêkanîna şêweyên parastina ji vîrosa koronayê, biryareke wiha piştgirîya ji sedî şêst û pênc ji xelkê Almanyayê dibîne. Ev mînak dikare bibe yek ji sedên mînakan ku êdî vî bûnewerê ku bi çavan nayê dîtin, jîyana xelkê li her deverê da ber pêlên guherandinên berbiçav. Ez dixwazim di vê nivîsê de van guhertinan bi çend têbînîyên ji jîyana xwe ya rojane bi gewde bikim.
Li ser asta takekesane:
Wekî ku karmendê dezgeheke fermî ji dezgehên bajêr, divîyabû ji 16.03.2020an û pê ve li malê rojê 8 demjimêran karê xwe berdewam bikim, hefteyê rojekê tenê biçim cihê kar. Wisa jî hemû soz û hevdîtinên bi xelkê re hatin betalkirin û danûstendin ji wê rojê pê ve divê tenê di rêya telefon û e-mailan re be. Ji bo pêkanîna vê yekê hemû bernameyên kar li ser komputerên me yên malê hatin barkirin.
Wisa li seranserê Almanyayê hemû karûbarên civakî û qanûnî û jîyana rojane di rîya telefonê, e-mail û postê re dimeşin.
Bê guman karkirina li malê ne karekî wisa hêsan e, nexasim ku hemû dibistan, dezgeh û cihên lîstikê yên zarokan girtî ne û zarok hemû li malê ne.
Derketina ji malê, divê yan ji bo kirînê û bidestxistina alavên xwarin û vexwarinê be, yan jî ji bo çûna cem doktoran be.
Li ser asta giştî:
Ev demek e ku li Almanyayê, çi di çapemenîyê de çi jî di qada şêwirmendîyê de be, du beşên civakê bi awayekî berz derketine pêş:
- Yek jê Wezareta Tendirustîyê ye, ji wezîr bigire hetanî bi “vîrologên” li nexweşxane û laboratoran kar dikin.
- Ya din, Wezareta Aborîyê ye, ji wezîr bigire hetanî bi aborînasên ku di dezgehên têkildarî karsazên piçûk û mezin de kar dikin.
Hema hema bi awayekî rojane yan yek ji wan yan jî her du wezîrên navborî bi hev re li ser ekranên televîzyonan têne dîtin.
Wisa dîyar e ku hatina vîrosa koronayê sîyasetmedarên welêt ji ber çavan dan alî û hemû biryarên ku di qada sîyasî de têne girtin, piştî şêwra bi pisporên tendirustîyê û aborîyê re, têne stendin.
Dîyardeyeke balkêş di vê navê re li Almanyayê xwe da pêş, ew jî valabûna dikan û marketan ji kaxetên tuwalêtan bû. Yekem tiştê ku li Almanyayê bi hatina vîrosa koronayê re û heta niha peyda nabe, ne nan, ne av, ne rûn û xwê û ne jî şekir e, lê belê kaxetên avdestxaneyan in.
Bê guman dikare gelek têbînî li ser sîstema tendirustîyê û kêmbûn an tunebûna maskeyan jî li welatekî ku pîşesazî lê ew qasî xurt e bêne rêzkirin. Wisa jî li ser şêwe û




Helîm Yûsiv

metodên bisînorkirina belavbûna koronayê dikare bi mehan bêne gotûbêjkirin. Plana hikumetê ew e ku piştî 20ê nîsana 2020an hinek gavên ber bi sistkirinê ve bêne avêtin û wisa gav bi gav ber bi jîyana asayî ve vegerin. Wê ev gavbigavbûna ku behsa wê tê kirin çi qasî dirêj bike, ez nizanim. Lê tiştê ez baş dizanim ew e, êdî ew jîyana asayî, ya normal, ya behsa wê tê kirin wê tu carî ji sedî sed wekî berê venegere.
Jîyana piştî koronayê, wê tu caran nebe mîna jîyana berî wê.

# Gerek milet êdî vê malwêranîyê qebûl neke

Ev çend roj in hêzên çekdar ên YNK, PDK û PKKê li başûrê Kurdistanê li herêma Zînî Wertê hatine hemberî hev, gefan li hev dixwin. Her sê alî li dijî hev beyanan belav dikin, hevûdu bi hin sûcan tometbar dikin.
Ez bi xwe nizanim mesele çi ye, çima wiha dikin…
Li alîyê din balafirên Tirkîyeyê jî her roj herêmê bombebaran dikin, gerîla, pêşmerge û gundîyan dikujin.
Kurd çi ji hev dixwazin, hêzên wan çima ne wek birayên hev, lê wek neyaran hatine hemberî hev meriv fahm nake. Yê min bi xwe bi qasî misqalekî jî hêvîya min ji van partîyan êdî nemaye, bi van partîyan û bi van serok û kadiran ne mumkin e kurdan ji vê kaosê\ tevlihevîyê xelas bibin. Ji zû da ye ez vê fikra xwe dubare dikim. Ev partî û kadroyên sîyasî nikanin ji kurdan ra tu dewlet mewletan çêkin.
Ji 1991ê vir da ye, ev 29 sal in li başûrê Kurdistanê kurd bûne wek dewleteke serbixwe, lê ji bo avakirina dewleteke netewî kevirek nedane ser kevirekî, her kes ji bo xwe, ji bo partîya xwe xebitîye û xwe û derdora xwe zengîn kiriye. Pereyên petrola miletê kurd bera bêrîka xwe dane û piranîya wan bûne milyardêr. Bi qasî xuya dike sîyasetmedar û serokên partîyên hene ji halê xwe razî ne, naxwazin dewleteke kurdî çêbibe û ji bo wê jî bingehê dewleteke netewî navêjin. Ji dêlî avakarina bingehê dewleteke netewî, artêşeke netewî, partîyên xwe û malbatên xwe xurt, zengîn û çekdar kirine û dikin..
Ji zû da ye ez gihîştime wê bawerîyê, heta ev serok û ev kadro li başûr, li ser hukim bin, heta ku ew mezin û rêberên kurdan bin, ne mumkin e yekîtîya netewî çêbibe û kurd bibin xwedî dewlet.
Heger ne piştgirîya Amerîka û hin dewletên ewrûpî be nuha ev îdare jî nemabû; Iraq, Îran û Tirkîyeyê ewê ev îdareya heyî jî hilweşandibûya.
Û hîn jî ev tahlûke heye.

Sibe di nabêna PDK, YNK û PKKê da şer derkeve, ihtîmal heye tiştê nuha heye jî ji destê wan here.
Bi bawerîya min, ê heta nuha li başûr kurd li ser nigan hiştine Amerîka û piştgirîya hin dewletên ewrupî ye, heger ne sersûyî û piştgirîya wan bûya, ewê şerê hev bikirana û tiştê nuha heye jî wenda kiribûna.
Yên di 29 salan da artêşeke netewî, dam û dezgehên netewî ava nekin û hîn jî xwedî hêzên çekdar bin, ji nuha û pê da jî ji kurdan ra tu havilê nakin; ew ê xerabtir bikin.
Ji bo xelasbûna ji van kes û partîyan



Zinarê Xamo

tenê rêyek heye, dibê gel serî hilde, îtîrazî vê malwêranîyê bike, dakeve kuçe û kolanan û guherandineke radîkal bixwaze, vê rewşa heyî, şiklê vê îdareya herdu alîyan jî qebûl neke û dewleteke netewî, artêşeke netewî bixwaze, çekdarên partîyan qebûl neke.
Heta gel bêdeng be, rewşa başûr dê tu carî baştir nebe û her ku here xerabtir bibe û di dawîyê da tiştê nuha heye jî dê wenda bikin.

# Konê Reş: Dema ku pêşengên civakê wiha bin, gelo wê civak çawa be!

*Hevpeyvîner: Rizoyê Xerzî*

**- Mamoste salên dûvedirêj tu di warên cuda yên zimanê kurdî de xebatên xwe dikî, tu dikarî çîroka xwe û destpêka nivîsîna bi zimanê kurdî ji xwendevanên Xwebûnê re bibêjî?**

Têkilîya min bi zimanê kurdî re ji gundê min Doda dest pê kir. Ev gundê ku kesî jê ne bi zimanê erebî ne jî bi zimanê tirkî zanîbû. Di nav wê trajîdîya zimanî de mezin bûm, min xwend û bi gîyanekî kurdperwerî hatim xwedîkirin. Gelek caran bi Seydayê Cegerxwîn re rûdiniştim. Hingî, min jî wek tevayî nifşê xwe, hin caran bi zimanê erebî dinivîsî. Carekê min jê pirsî; Seyda! Tu bi zimanê erebî yan bi zimanê kurdî bêtir karî his û hestên xwe bînî der? Seyda beşişî û li min vegerand; bi kurdî. Ji wê hingê ve nivîsîna bi zimanê kurdî niqutî dilê min.

Di sala 1977an de li Almanyaya Rojava, bi şahî çav bi rojnameya "Roja Welat"ê diketim, bi kurdî û tirkî bû. Piştî vegera min a Qamişlo di sala 1978an de, min dest bi nivîsîna kurdî kir, belê di warekî biçûk de bû, ji ber ku ziman qedexe bû. Bi naskirin û çûna cem van ronakbîr û zanayên kurd: Cegerxwîn, Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), Osman Sebrî, Rewşen Bedirxan, Seydayê Tîrêj… bêtir hezkirina ziman bi min re mezin bû û kurdewarî û zimanê kurdî bi min şêrîn bûn.

**- Mamoste, gelo ev meseleya nasnavê Konê Reş çawa û ji kû peyda bû?**

Sebaretî nasnavê min "Konê Reş"; ev nasnav, kalkê min "Ehmed", an ku bavê bavê min ê ku di heyama xwe de mixtarê gundê Doda bû, wî ev nav bi wateya sexîbûn, mêranî û dilfirehbûnê li cîranê xwe Ehmedê Pitê kir. Ehmedê Pitê, mirovekî feqîr, comerd û sexî bû, derîyê wî her dem vekirî bû… Hem jî, ji zimanê kurdî pê ve bi ti zimanan nizanîbû. Mirovekî bi cil û bergên kurdî yên orjînal girêdayî bû; kum û kolozekî reş li serê wî bû. Vî mirovî gelek çîrokên kurdî yên folklorî zanîbûn. Berê, ez di vî navî de diponijîm û min hezê dikir. Bijartina min ji vî navî re bi gelek wateyan e; ji rexekî ve, reşahîya ku wê demê konê xwe di ser welatê me re vegirtibû. Ji rexekî din ve, kon her dem vegirtî ye. Kon, mirovan ji sermê û germê diparêze. Kon bi vegirtina xwe xuya ye, rêwî, birçî û hejar xwe lê digirin, di bin sîya wî de xwe ji germê û sermê diparêzin.

**- Di salên destpêka naskirina te ya bi zimanê kurdî de herî zêde bandora kê û çi li te bû?**

Roja îro ez Prof. Dr. Celîlê Celîl wek mamostayekî di warê eşq û danheva folklora kurdî de ji xwe re dibînim. Di warê nivîsîna gotaran de jî, ez ji "Tîr"a Mûsa Anter, ewa ku di rojnameya Welat de li Stenbolê dihat weşandin û ji "Bexçe"yê Kemal Burkayî (Ferhad Can), ewa ku di rojnameya Ronahî de, ew jî li Stenbolê dihat weşandin, fêrî nivîsîna gotaran bûme. Jixwe kêfxweş dibim ku şagirtekî Mîr Celadet Bedirxan bim. Bê guman, rola navtêdana bavê min jî, di vê pêvajoyê de mezin e.


**- Gelek nivîs û lêkolînên te der barê malbata bedirxanîyan de çêbûn, tu dikarî bi kurtasî hinekî behsa rola wê malbatê bikî di wêje û zimanê kurdî de?**

Rola bedirxanîyan zor mezin e. Bedirxanî kurdistanî difikirîn, asoyên wan ji herêmî mezintir bûn, doza wan tenê Kurdistanek bû, ne gelek Kurdistan bûn, banga wan kurdisanî bû. Tevî ku neferên vê malbatê ji sala 1847an ve di koçberî û sirgûnîyê de dijîyan, lê wan qet welatê xwe Botan, warê bav û kalên xwe, ji bîr nekir, ji desthilanîn neketin, li ber xwe dan û gelek xebat û bizav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin. Neferên vê malbatê di sirgûnîyê de, di bin şert û mercên çetin û dijwar de, xwe berpirsyarê gelê xwe didîtin û kêşeya gelê kurd barê xwe yê yekemîn dinasîn. Bi gotin û kirinê dixebitîn; çi di warê civakî û rewşenbîrîyê de çi jî di warê sîyasî de û wiha tev di sirgûnîyê de, dûrî xaka Cizîra Botan mirin her û her daxwaza wan pêşxistina gelê kurd û bilindkirina navê Kurdistanê bû. Wan bedirxanîyan gelek komele û dibistan damezirandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem jî bi saya wan gelek navend û enstîtû ji gelê kurd re hatine avakirin.

Nevîyê Mîr Bedirxan jî, Mîr Celadet Elî Bedirxan (1893-1951), hêvîyên bav û bapîrên xwe li erdê nehiştin, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawî ji temenê xwe. Wî jî 15ê Gulana 1932an hejmara pêşîn ji kovara xwe "Hawar" a bi tîpên latînî, li Şamê çap kir û di nav kurd û bîyanyan de belav kir. Wî jî, bi Hawara xwe, qêrîn û gazîya bav û bapîrê xwe gihand kurdan û got: "Herçî em kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxifin, piranîya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî."

**- Di navbera salên 1960 û 1980yî de, piştre pêvajoya ji 1980yî heta sala 2000î, çi guhertin di warê ziman û wêjeya kurdî de hatin kirin?**

Di navbera salên 1960 - 1980yî de tu guhertinên berbiçav di warê ziman û ferhenga kurdî di nav kurdên Rojava de nahatin kirin. Lê tevî qedexebûna ziman, rewşenbîrên kurd li ber xwe



dane, ji desthilanîn neketin. Piştî ku 14ê hezîrana 1957an, Partî Demokrat a Kurd li Sûrîyeyê hatiye damezirandin, vê partîyê rojnameya Dengê Kurd bi kurdîya latînî derxistîye. Di sala 1966an de Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar) bi tena serê xwe kovarek bi navê Agahî, bi rengekî veşarî diweşand. Û di sala 1968an de Cegerxwîn kovara Gulîstan weşandiye. Di sala 1979an de kovara Gelawêj, sala 1983an kovara Stêr, sala 1986an kovara Xunav û sala 1989an kovara Gurzek Gul… Belê ji sala 1990î û vir ve, hinekî çavgirtin ji çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî hat girtin. Di wan salan de gelek kovar û rojnameyên serbixwe û dîwanên helbestan û pirtûkên têvel ji rex nivîskaran ve hatin çapkirin û her wiha gelek kovar û rojname jî ji rex rêkxistinên kurdî ve hatin weşandin. Ew jî bi dizî û eger bihatina girtin cezayê wê mezin bû.

**- Niha di jîyana me de gelek guhertin dibin û bêtir xebatên dîjîtal û online derdikevin pêş. Di van şert û mercan de gelo tu rewşa wêjeya kurdî ya îro çawa dibînî?**

Agahîyên min ên berfireh li dor xebatên dijîtal û onlinê nînin. Bê guman sûdeya wan heye. Nexasim ji me kurdan re, lê tiştek nabe wek gotina teka teka, an ku ya rûlirû. Belê li gor rewşa me û qedexebûna ji sed salî ve li ser zimanê me hebû gelekî baş dibînim. Derîyekî nû li ber me hatiye vekirin.

**- Te seydayê Cegerxwîn jî dîtibû tu dikarî behsa bîranîneke xwe ya bi Seyda re bikî?**

Sebaretî pêwendîyên min bi Seydayê Cegerwîn re, wek ku min gotiye; di wan salên berî ku Seydayê Cegerxwîn di sala 1979an de here Swêdê, ez xort bûm, min ji sîya xwe re digot bi wir de here…! Devdelingê şerwalê min fireh bû, erd bi xwe re rêş dikir. Porê min dirêj û gijikî bû û cênîkê min wekî potînan bûn. Her pêlekê ez û çend hevalên xwe diçûn serdana wî. Kêfa wî ji me re dihat û digot: "Kêfa min ji xort û keçan re tê. Ew ên rojên hatî ne, yên wekî min xêr di me de nemaye." Û ji me re helbestên xwe yên nû dixwendin û di nav re qala kurdan dikir; qala Mîr Celadet Bedirxan û kovara wî Hawar, Mîr Dr. Kamîran Bedirxan û rojnameya wî Roja Nû, Rewşen Bedirxan, Osman Sebrî, Dr. Nûrî Dêrsimî, Qedrî Can û di nav re dema ku gotin dihat dor stranên Şivan Perwer û helbestên wî yên ku Şivan kirine stran, digot: "Şivano hinekî kela dilê min hênik dike. Ji min xweştir dibêje."

**- Tu dikarî hinekî behsa romana xwe ya Berîya Mêrdînê bikî?**

Sebaretî romana min, Berîya Mêrdînê, "Romana Heymên Derbasbûyî": Min bi vê romanê, Berîya Mêrdînê li serad, bêjing û moxilê xistiye! Dema nivîsîna vê pirtûkê min bi firehî hêvîyên xwe berdan ser bîra xwe ya zaroktîyê; serwextîya xwe ya niha û bi zanebûna xwe ya îro û ezber; wek şahidê demeke dîroka me kurdên Cizîrê, min beşek ji bîranînên xwe wekî romanê di Berîya Mêrdînê de danîye ber çavan. Bê guman, ev roman ne serborîya min tenê ye, serborîya piranîya nifşê min e. Şêweyek ji şêweyên jîyana min û jîyana hevçerxên min e di Berîya Mêrdînê de. Ev pirtûka min ne romaneke pexşaneyî ye, bêtir dikarim bibêjim ku xepartineke durist e ji hebûn û vejandina me xelkên Berîya Mêrdînê re.

**- Peyamên te di vê rewşa nazik de bo nivîskar û rewşenbîrên kurd çi ne?**

Gotina dawî: Mixabin rêxistinên me girîngîyê nadin zimanê kurdî. Zimanê kurdî wekî nasnameya hebûnê di nav gelên dinyayê de nabînin! Qîmeta zimanê me li cem wan nîne. Mixabin jî, yên ku sîyasetê dikin, naxwînin. Eger hinekî bi erebî an tirkî dixwînin jî, lê ew qet bi kurdî naxwînin! Dema ku pêşengên civakê wiha bin, gelo wê civak çawa be!

**Konê Reş (Selmanê Osmanê Evdo):** Nivîskar û helbestvanê kurd e. Di sala 1953yan de li gundê Doda yê bajarê Qamişloyê hatiye dinyayê. Heta niha derdora 20 pirtûkên wî hatine çapkirin, di nav wan de 3 pirtûkên helbestên zarokan hene û pirtûka wî ya dawîn romana bi navê Berîya Mêrdînê ye.

Jêder: Rojnameya Xwebûnê

# "Antolojiya Helbesta Nûjen a Rojavayê Kurdistanê" derket

**Aştî - Taybet**

"Antolojiya Helbesta Nûjen a Rojavayê Kurdistanê" ya nivîskar Cano Şakir, di 23yê adara 2020an de ji nav Weşanên Arê ku navenda wê li Stenbolê ye, derket. Ev berhema han ji 718 rûpelan pêk tê û 96 helbestvanên rojavayê Kurdistanê li xwe digire.

Helbestvan Cano Şakir der barê pirtûka xwe de wiha ji Rojnameya Aştî re axivî: "Piştî salekê zêdetir, min xebata Antolojîyê ya ku ji 96 helbestvanan pêk tê bi dawî kir."

Di berdewamîya axaftina xwe de, Şakir armanca amadekirina vê pirtûkê û naveroka wê wiha dide nasîn: "Yek ji armancên min ew e ku ne tenê ez helbestvanan di nava vê Antolojîyê de li hev bicivînim; lê pê re ez çavekî li helbesta cîhanî bigerînim û rewşa wê binirxînim. Her wekî: helbesta almanî, fransizî, espanî, tirkî, erebî û îranî, min bi rengekî felsefî zelal kirine."

Lîsteya helbestvanên ku di "Antolojiya Helbesta Nûjen a Rojava" de cih girtine: Cano Şakir, Rêber Hebûn, Xebat Şakir, Şêro Dalînî, Emîra Mistefa, Suad Husên, Nûrşan Hisên, Ciwan Nebî, Kemal Necim, Amedê Xursê, Cîhan Hesen, Mehmûd Badilî, Azer Şiwêş, Mîdiye Berekat, Beşîra Derwîş, Xemgîn Remo, Ciwan Qado, Raman Seydo, Ibrahîm Ebdî (Keser), Mişe'lê Osman bavê Nisrîn, Majda Darî, Husên Hebeş, Hêvîn Hiso, Zîwer Etman, Wecîha Ebdirehman, ArdilanAbdo, Silêman Azer, Gulistan Awaz, Ezîz Xemcivîn, Tengezarê Marînî, Hesen Eyû, Şaha Peyvan, Abbas Abbas, Dr. Gundî Dilberz, Şadiya Xelo, Nûh Silêman, Demhat Dêrikî, Raman Hesê, Burhan Hiso, Rizgar Hiso, Mizgîn Hesko, Sîmav Efrîn, Ebdoyê Heydo, Ednan Şêxê, Can Bapîr, Xelat Ehmed, Evdî Çaço, Beşîrê Mele Newaf, Çîmen Mûrad, Leyla Reşo, Narîn Dêrikî, Kovan Kinho, Meryem Temir, Evîn Ibrahîm, Vejîna Kurda, Yasîn Hisên, Enes Hecî Qasim, Temoz Şemalî, Narîn Omer Seyfedîn, Rûxweşê Zîvar, Evîn Şikakî, Goran Haco, Ibrahîm Xelîl, Melevan Resûl, Ehmed Huseynî, Salihê Heydo, Dîlber Haco, Can Birahîm, Rûşen Yûsif, Adnan Hasen, Alan Hemo, Ebdilselamê Xoce, Dilşa Yûsûf, Zahid Mehmûd, Xalid Omer, Hozanê Girkundê, Elwan Şivan, Axîn Mîrxan, Konê Reş, Luqman Ebdirehman, Lukman Mehmûd, Anahîta Sîno, Hekîm Sefqan, Yûsiv Birahîm, YasînAhmad, Dilyar Dêrikî, Mesûd Xelef, Ronî Elî, Seydo Reşîd, Mihemed Bîco, Merwan Elî, Pîr Êzdîn Pîr Îdo, Zerdeştê Kal, Hebet Hemo, Hena Daoud û Ebdilwehab Ezîz.




Kurtejîyana Cano Şakir:

Helbestvan û nivîskarê kurd Cano Şakir, di 24.12.1974an de li gundê Tilxatûnê yê girêdayî bajarê Tirbespîyê ku ser bi navçeya Qamişloya rojavayê Kurdistanê ve ye, hatiye dunyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gund temam dike û ya navendî li bajarê Tirbespiyê bi dawî dike.

Di despêka salên 1990î de, berê xwe dide Şamê paytext. Li wir çend hevalan nas dike û xebatên wî yên ji bo muzîk û şanogerîyê bi rê ve diçin. Heta salên 1997an êdî berê xwe dide koçberîyê û li Almanyayê bi cih dibe. Nivîsên wî di kovar û rojnameyên wekî: Polotîka Azad, Yeni Özgür politik, Dîyarname û gelek malperan de têne weşandin.

Cano Şakir hîna di salên xwe yên dibistanê de têkilîya wî bi helbestê re hebû.

Di sala 1989an de helbesta yekem bi navê "Ez kurd im" nivîsîye.

Ji wê çaxê heta niha ew bi helbest, çîrok, gotar û hin nivîsên din re mijûl e.

Ji havîna 2018an ve, di Çira TVyê de bernameya "Pencereya Wêjeyê" pêşkêş û amade dike.

Berhemên wî yên çapkirî ev in:

1- Rojava, helbest, Weşanên Arê 2013
2- Rêwîtîya ber bi avê ve, çîrok, Weşanên Arê 2014
3- Şeva tirsê, helbest, Weşanên Arê 2016
4-Şavîya mirinê, helbest, Weşanên Arê 2017
5- Împeratorîya helbestê (nameyên ji gazinan), Weşanên Arê, destana helbestî, 2017
6- 77 pêlên ji bêhna leyana şevê, destana helbestî, Weşanên J&Jyê, 2018
7- Rawestgehên bendemanê, destana helbestî, Weşanên Arê 2018
8- Helbestname (1), helbest, Weşanên Arê, 2019
9- Helbestname (2), helbest, Weşanên Arê 2019
10- Antolojîya helbesta nûjen a rojavayê Kurdistanê, Weşanênê Ar 2020

# Cejna Çarşema Sor

**Ayhan Erkmen**

Rojhilata Navîn dergûşa mirovahî û şaristanîyê ye. Ev ax çavkanîya gelek bawerî, ol û mezhebên pîroz e. Ji wan olên herî kewnar yek jî êzdîyatî ye.

Ola êzdîyatîyê li ser bingeha hezkirinê hatiye afirandin; êzdîyatî xwedahez, xwezahez û mirovhez e. Ji hemû bawerî, ol û mezheban re rêzdar û aştîxwaz e.

Nîşaneyên vê yên herî mezin; mirov ji pey re nabe êzdî, ji dayîkê bi êzdî tê rûyê dinê. Êzdî ji bo bawerîya xwe belav bikin, di nav olên din de xebatê nakin.

Dîsa êzdî ji dervayî civaka xwe bi civakên dinê re zewacê çênakin. Neyarên wan be jî dest navêjin jinên wan.

Di dîroka vê ola qedîm de gelek cejn û rojên pîroz hene. Ji wan yek jî Çarşema Sor ango Çarşema Serê Nîsanê ye. Li gorî salnameya îrohîn, li çarşema ewil a ji pey 13ê nîsanê, wekî cejna Tawisî Melek û wek Sersal tê pîroz kirin. Li gorî bawerîya êzdîyatîyê gerdûn roja çarşemê ango roja çaran hatiye afirandin. Li wê rojê Tawisî Melek xwe berdaye ser axê û afirandina gerdûnê temam bûye. Roja detpêka jîyanê ye. Ev di qewlekî êzdîyatîyê de wiha tê ziman 'Te dinê xemiland hezar avaz û reng e/ Ya! Melekê



Qencîyê xweş tê ji te deng e'.

Di Çarşema Sor de guneh tên efûkirin, dawî li şer û pevçûnan tê, rijandina xwînê guneh e, teqez can nayê girtin, wek roja aştî û xwişk û biratîyê ye. Hem jî despêka şênbûna xwezayê ye û di meha nîsanê de êzdî bûkan dernaxin, ji ber bûka salê nîsan bi xwe ye.

Hin rêûresmên Çarşema Sor hene; di vê cejnê de hêk tên xwaşilandin û bi rengên xwezayê tên boyaxkirin. Di vê veguherîna hêkê de mena afirandina dinyayê heye. Hêk dema xav e; nîşaneya halê dinyayê ye dema ku av e. Bi xwaşilandina hêkê re dema ku dinya dibe ax û bi rengên biharê ve dema ku reng bi reng tê boyaxkirin jî tê mena, dema ku milyaketan dinya reng bi reng xemilandiye. Qalikên hêkan ên reng bi reng nîşaneya xêr, xweşî û bereketê ne. Di cejnê de, bi serdanîya goristanê, ev qalik li dora goran tên danîn. Di nav zevî û mêrgan de tên belavkirin û dîsa ev qalik bi gihayên biharê re tên hasilandin û ev hevîr bi dergehên avahîyan ve tê zeliqandin.

Reûresmeke din jî çêkirina 'basimbarê' ye; basimbar bi benikên zirav ên rengîn tê hûnandin. Wateya basimbarê jî xêr, bereket û girtina pêşîya qeda û belayan e. Basimbar bi destên jin, mêr, keç û zarokan tê girêdan.

Her wiha di vê cejnê de kulîçe û gelek cureyên şîrînayan jî tên amadekirin. Li gor bîranînên nivîskar Ezîzê Cewo, dema ku kebanî kulîçeyan çêdikin morîyekê dikin nav wê. Mezinê malê di taştêya serê siba cejnê de kulîçeyê bi gotina 'ev para Mêrê Rojê, ev para Xudanê Malê, ev para Zîyayê Zer, ev para Mamereşan, ev para Mamê Şivan, ev para Gavanê Zerzan, ev para xeta cot, ev para malxîyê malê, ev para rêwîyê me, ev para xwendekarê me…' yeko yeko dijmire û kerî dike. Her kes bêsebir li bendê ye ku ka morî di para kê de derkeve.

Morîya mala me di kulîçeya para Zalê birazîyê we de derket ya bi xêr. Bila Çarşema Sor bi gelê me û hemû cîhanê pîroz be. Bibe wesîleya aramî, aştî û azadîyê û ev nexweşîya kambax ji pêşîra mirovahîyê bikeve.